



Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)

wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

Xeleka Gotaran: Kurd û Îslama Siyasî
Xelek 16

Serpêhatiya Rêberê Kurd Abu Muslimê Xurasanî

(2) Abu Muslimê Xurasanî kî ye?

Di dîroka *Îslama Siyasî* da diyardeyeka gelek balkêş derbarê mijara kurdî heye; ew jî ewe ku di sê sedsalên goçî yê destpêkê da nasnameya pir kesayetiyên kurd ên navdar di tariyê da maye. Ev kesayetî yan li ser Farisan, yan li ser Ereban û hin caran jî li ser Nebtan (rûniştivanên başûrê Îraqê) hatine hejmartin; yan jî wek kesayetiyên nenas mane. Kesê lêkolîner neçar dimîne ku li gelek jêderan vegere daku bikaribe agahdariyekê bibîne, ya ku wî bigihîne rastiyê û mijarê piştrast bike ku koka vê kesayetiyê, yan filan kesayetiyê Kurde. Mijara nasnameya rêberê Kurd *Abu Muslimê Xurasanî* jî bi vî awayî ye.

Nav û Warê Resen:

Piştî ku *Abu Muslim* bû endamê tevgera Şî'î *Al El Beyt* ya li dijî *Xilafeta Umewî*, bi navê *Ebdurehman Bin Muslim* hat naskirin. Navê wî yê rastîn *Behzad* yan jî *Behzadan kurê Bendar (Bendaz) Hurmiz'e*. Gava bavê wî ayîna Musilmantiyê wergirt navê xwe kir *Osman*⁽¹⁾. Di agahdariyeka din da tê gotin ku navê wî *Îbrahîm kurê Osman kurê Yesar kurê Şezûs (Sedûs) kurê Cuderz'e (Guhderz)*, û paşnavê wî *Heykan'e (Heygan)*. Dibêjin ku ew ji neviyên wezîrê bi nav û deng yê dema Sasaniyan *Buzurg Mihir (Buzurg Mihir) kurê Bextikan'e*. Gava bûye endamê tevgera *Al El Beyt*, *Îmam Îbrahîm* jêra gotiye: „*Navê xwe biguhêre; emê serkeftî nebin heger tu navê xwe neguhêrî*“. Rabû nav li xwe kir *Abdurehman*"⁽²⁾.

Li ser çespondina cih û warê ku malbata wî jê hatiye jî cudahiya bîr û bawer heye. Hin dîroknasan guman kirine ku ew ji Xurasnê ye. Lê rastî ewe ku ew bi navê Xurasanî hate naskirin dema ku *Îmam Îbrahîm* ew kir berpirsiyar û serdarê tevgerê li Xurasanê. Li gor piraniya agahdariyan, tê gotin ku warê malbata wî gundekî bi navê *Nawane* ye û ev gund li herêma *Fatîq*. Dîroknas *Ibin Xurdazbe* *ابن خُرداذبِه* navê herêmê bi awayê *Qayiq* gotiye. Belkî jî ev cudahiya nav şaşîtiyeka nivîsînê be di ragihandina vê agahdariyê da. Di dema destpêkê da nivîsîna erebî bê nuxtik û bê esir-hustin duhate nivîsandin. Ev jî pir caran dibû

sedem ku guhartin û şaşîtu pêkwerin. Ev herdu herêm wê demê ji aliyê rêvebirinê va ser bi navenda *Esbehanê* (*Esfahanê*) bûn⁽³⁾.

Gava em van agahdariyên ku di pirtûkên erdnîgarînasên Îslaman yên kevin da hatine bi nexşa Îranê ya niha û herêmên kurdî ra li rojhilatê Kurdistanê bidin ber hev, tê xuyakirin ku ew herêma malbata *Ebo Muslim* jê hatiye li başûr-rojavayê *Esfahanê* dikeve. Yanê li wê herêma kurdî ku di navbera *Esfahan* û *Xozistanê* (*Ehwazê*) da ye; yan jî li rojavayê *Esfahanê*, di navbera *Esfahan* û *Loristanê* da, li warê Kurdên Lurre (Lor). Çawa dibe jî, ew herêmên li nêziya *Esfahanê* ji aliyê başûr va çiyayê *Bextiyar* û ji aliyê başûr-rojava *Ehwaz* û ji aliyê rojava va *Loristan*'e. Ev hemû herêm jî wê hîngê herêmên kurdî bûn. Bi her awayî ev herdu herêm *Firîzîn* û *Fatiq* li herêma *Kurdên Lurr*'in û malbata *Ebo Muslim* ji *Kurdên Lurr*'e. *Kurdên Lurr* li aliyê Îraqa niha bi navê *Kurdên Feylî* û *Pehlî* tên naskirin. Ev navê *Pehlî* vedigere ser navê *Pehlewî* (*Pehlewanî*) yê kevin (li nexşeya Îranê temaşê bike).





Kok û Binyat:

Wek me berê jî gotibû, cudahiyeke bîr û bawer li ser kok û binyata *Ebo Muslim* heye. Hinekan ew vegerandiye ser binyateka erebî. Xelîfe *Ebo Cehfer El Mesor* ew sûcdar kiriye ku wî binyata xwe vegerandiye ser neviyên *Selît kurê Ebdullah kurê Ebbas El Haşimî*. Belkî jî ev sûc bi awayekî zordar lê hatiye barkirin. Yan jî ji ber wê yekê kiriye ku şerefa kok û binyata malbata Haşimî wergire. Bi her awayî, wî berevaniya xwe li dijî vî sûcî nekiriye û ew bê deng maye, an jî dîroknesan wisa gotiye. Lê belê rastî ewe ku ji kok û binyateka Kurde. Belgeya yekem ewe ku malbata wî ji herêma *Kurdên Lurr'e* û belgeya duwem ewe ku helbestvan *Ebu Dulame* piştî kuştina wî bi zimandirêjî li ser wî dibêje:

أبا مُجْرِمٍ، ما غَيْرَ اللَّهِ نِعْمَةً على عبده حتى يغيّرَها العبدُ
 أفي دولةِ المَهْدِيِّ حاولتَ غَدْرَةَ ألا إنَّ أهلَ الغدرِ آباؤك الكُذُؤ.

Bavê tewanbar, Xweda nî'meta ku daye koleyê xwe naguhêre, heya ku kole were û biguhêre

Di dewleta Mehdî da te xwestiye tu îxanetiye bikî, yên îxanetcî bav û bapîrên te yên Kurdin⁽⁴⁾.

Divêt bê gotin ku ev *Ebu Dulame* koleyekî Hebeşî reş bû û navê wî yê rastîn *Zend kurê Cewn* bû. Ew bi taybetî helbestvanê xelîfeyê Ebbasî yê yekem *EL ssefah* û di pey ra yê birayê wî xelîfe *El Mesor* û paşê jî yê xelîfe *El Mehdî kurê El Mensor* bû. Yanê ew helbestvanê malbata serdar bû, li civînên wan rûdinişt, pesna wan dida û ji ber va diravên pir werdigirtin. Ew bi xwe jî mirovekî bê qidûm bû û wek qeşmer kar dikir ku xelîfe pê bikene⁽⁵⁾.

Helbet, ti guman têda nîne ku *Ebu Dulame* kok û binyata *Ebu Muslim* ya Kurd ji ber xwe derxistibe, wî agahdariyên naskirî ku li ba xelîfe û karmendên mezin hebûn gotine. Ji ber ku nayê aqilan xelîfe û karmendên wî yên mezin ewqas nezan bin ku kok û binyata rêberê ewqas mezin û girîng wek *Ebu Muslim* nasnekin. Belkî hin kes bêjin: Başê, madem kok û binyata *Ebu Muslim* dihate naskirin, gelo çima ev rastî bi dirêjahiya salan nedihate gotin, tenha gava xelîfe *El Mensor* fermana kuştina wî bi îxanetî dide?

Xuyaye ku sedem vedigere ser wê êrişa seferber ya raholkirina nav û dengê Kurd. Em li ser vê mijarê di xelekên derbasbûyî da rawestiyabûn û me gotibû ku rah û damarên vê êrişa raholkirinê vedigere ser heyama Farisan di dema *Darayê Yekem* da û di pey wan ra serdarên Aşxan (Part) ev êriş berdewam kirin heya ku gelên Ariyanî di navbera 250-î b.z. ta 226-ê z. xistin bin serdariya xwe û navê Kurd li cihê navê Mad yê di cîhanê da navdar û rûmetdar bikaranîn, piştî ku ev nav ji maneya "çiyayî, qehreman, leheng" vala kirin û kirin bi maneya "çiyayî, şivan û li şûnmayî". Belkî jî padîşahê Aşxanî yê dawiyê *Erdewan* ev şop ajotibe gava di nameya xwe da ji padîşah *Erdeşêrê Sasanî* yê yekem ra dibêje: "*Kurdê ku li bin konê Kurdan mezin bûyî, kê destûr daye te ku tu tacê deynî ser serê xwe?*" û mebesta wî ne ew bû ku ew ji kok û binyateka Kurde⁽⁶⁾.

Me berê gotibû ku hin rewşenbîrên Farisan, û yên ku bi çanda Farisî perwerde bûbûn, pir çîrok ji bo raholkirina nav û dengê Kurd di jêderên Îslamî da yên sê sedsalên pêşîn ji dîroka heyama Îslametiye durist kiribûn. Nav û dengê Kurd di jêderên dîrokî, ayînî û wêjeyî da bi awayekî xirab û ne hezkirî hatiye. Wisa xuyadike ku ji ber vê sedemê Kurdên ku di *Dewleta Xîlafetê* da dixebitîn kok û binyata xwe ya Kurd vedişartin û nedixwestin ku bê zanîn. Xuyaye ku *Ebu Muslim* jî wisa kiriye. Helbet di rewşeka wisa da rêberê mezin û payebilind wê ne bextewar be ku xelk zanibe ew ji kok û binyateka Kurde (çiyayî, şivan, li şûnmayî). Emê di pey ra bibînin ku wezîrên *Bermekiyân* yên bi nav û deng jî di dema Ebbsiyân da kok û binyata xwe ya Kurd veşartine; heya ku yek ji neviyên wan, qadî û dîrokzan *Ibin Xellikan* hatiye û piştî dora 400 sal rastiya wan ji me ra gotiye.

Gelo jiyana *Behzadê me (Ebu Muslim)* ya dema xortanî û ciwaniyê çawa bû?

Evê mijara xelesa me ya dahatî be.

Jêder

¹ Yaqot El Hemewî, *Ferhenga Wêjevanan*, 4/1753.

² Ibin Xellikan, *Wefiyat El E'yan*, 37145. *Shemseddîn El Zehebî, Sîret E'lam Ennubela'*, 6/48.

³ Ibin Xellikan, *Wefiyat El E'yan*, 3/149. Ibin Xurdazbeh. *El Mesalik we El Memalik*, rûpel 20 - 21. Ibin Hewqel, *Sûret El Erd*, 22/365, *El Ye'qobî: El Buldan*, rûpel 88.

⁴ Ibin Quteybeh *El Dînewerî, El Me'arif*, rûpel 420. Ibin Xellikan, *Wefiyat El E'yan*, 2/320 - 321.

⁵ El Tabari, *Dîroka El Tabari*, 2/39.

⁶ Ibin Xellikan, *Wefiyat El E'yan*, 4/9.